RÛXWESÊ ZÎVAR

GORISTANA BÊ GOR

1991

Joristana
Bê Jor


Ruxwesé Zivar
Goristana Bé ...
... Gor
1991

(ÇAPA YEKEM)

Mafê Çapê Parastî Ye
[Sala 1991]
1500

Wêne: DILDAR

Xêz : DILCAN

DIYARÎ

Ji bo:

HEVALA JÎNA XWE
KULÎLKÊN EVÎNA XWE
ROYA KU EZ MÊJANDIME
DILDARÊN WELATÊ XWE
VÊ BERHEVOKÊ DIYARÎ

DIKIM

RÛXWEŞ

S I P A S D A R Î

Ez hemû kesên, ku beşdarî û alîkariya xwe bo çapkirin û derxistina vê berhevokê pêşkêş kirine, sipas dikim, bi taybetî doktor Rênas û mamoste Hawarê Gundî û komîta sernivîsarî ya belavoka «KURDAX» û herweha piştgirtina bê sînor ji hêla koma Xanî de.

Rûxweş

NAVEROK

Navnîşan rûpel

Li şûna pêşgotinê 11
Gulîstana rohilat..... 22
Em ranabin ji cîhan 24
Kevoka aştiyê..... 26
Kurdistan û Felestîn 28
Sorgula Gulanê..... 31
Dengê mirovatiyê 33
çavreşa min 36
Oktober.....38
Yarê 39
Min rê naskir 41
Hevala min..... 43
Gulbihar..... 45
Efrîn.....47

Bûka bindest..... 49
Newroza 1986–an..... 51
Baran..... 53
Heyva dil 55
Zarokên şerevan 57
Helebçe 59
Keça jîr 62
Birîna reş 64
Derman..... 66
Dilber 69
Berxwedan 71
Dildarî 75
Jîna bi du rûyan..... 78
Xwe nafroşim..... 81
Agirê bê dû..... 84
Pîna mirovan 86
Goristana bê gor 89
Hişyari 93

LI ŞÛNA PÊŞGOTINÊ

Her kesê ku bala xwe bide tevgera çanda kurdî li Sûriyê, di van salên dawî de wê bibîne ku tevgereke toreyî, di vê dehsaliya nehan de ji sedê bîstan, di navbera gelek navên teze re, bi hêz xwe dide pêş çavan, nemaze jî tevgera helbestê. çi di rêka berhevokan re û çi di rêka kovarên çandî, wek «Gulîstan, Gelawêj, Stêr, Xunav, Zanîn û h.d.» re. Lê belê tevî vê yekê, em di xwe de nabînin, da em bêjin ew gihiştî–tevgere, ji ber ku tenê curekî ji cureyên toreyê tê de geşe, ew jî helbeste. Lê çîrok, şano û gotar, di demên ji hev dûr de, hîn gelekî bi fedî serên xwe hildidin.

Tiştê ku ji vê tevgerê tête naskirin û zanîn ewe ku hezkirina zimanê kurdî li ba ciwanan û germiya wan berçav dike. Ev yeka, li ba me, hêjayî pesnê ye. Lê mixabin, hezkirin û zanîna zimên bi tenê toreyê çênakin. Ew hezkirina gelek caran dibe bingeha peywendiyeke germ ku şagirtan–bê zanîn–têvedide ber deriyê torê. Lewra gelek ji wan lawan li rex astanê dikevin û nikarin meşîna xwe bidomînin, an nêrîn û dengên hin kesên berê dikayîkin, an jî tiştên ku ji ber sifrên wan kesên dîtir mane, dicûn. Gelek ji helbestvanên me, yên nû, di vê rewşê de hevpar û hevpişkin, lewra tevî ku «Qedrî Can û Cigerxwîn» koçên xwe barkirine û tevî ku «Osman Sebrî» heştê salî derbaskirî ye, ev helbestvanên teze, ta îro bi gavekê neketine pêşiya wan her sêyan. çima ?!...

Xwendin û mijûlbûna helbestvanên me, yên nû bi çanda tevayî – bi gelamperî – û bi çanda kurdî – bi taybetî – gelekî tenik û

qelse. Eger–wek çawa rehme lê Dr. «N.Za-za» berî 50 salî, di pêşgotina dastana «Memê Alan» de, diyar kiribû –; eger xwendevanên me li zargotin û kelepûra me ya gelêrî, vegerin, bixwînin û bikolin, bê gûman, wê gelek tiştên giranbiha jê derxin û bidin pêş çavên cîhanê. Lê mixabin, ew bang ta îro li ba me bê war û cî ma ye û guhên guhdar nedîtiye !...

Her kesê ku bi torê ve mijûle, dizane ku temenê helbesta serbest, li cîhanê bi tevayî, ji sed salî ne pirtire, lê belê folklora kurdî, ji hezar salî û virde, bi hebûna wê helbestê serfiraz û bextyare, wek çawa di dastana «Memê Alan» sazbûye:

Mem kete derê bajarê cizîra Botane.
Ji bîr kirin şîretên qîza Bekoyê Ewane.
Di devê derî da, Memê nihêrî ku
Kalekî rîsipî, emrê wî gihaye heftê û pêncane.

Ji erdê rabû, destê xwe avête lîwana
Bozê Rewane. *

Eger hûn vegerin «Zargotina Kurda» hûnê bibînin ku helbestên E'vdalê Zeynikê jî bi vî şêweyî hatine sazkirin, bo nimûne:

Zozana gundê me xoşe, li siya darê,
Felek, ez şaş kirime, ber daye gav li jorê, gav li xarê,
Felek xayîne, dewran bêbexte,
dikim–nakim qet nayê li karê,
Hey li–min,felekê.**
Lê mixabin gelek ji helbestvanên me,

* * *

* Dastana «Memê Alan» r.37,Şam; 1942 çapxana Kerem.

** Zargotina kurda; Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl, r. 101, Neşirxana «Nqûka», Moskva 1978.

yên teze û nûjen, ew tiştên giranbiha li paş xwe hiştine û xwestine şûna xwe di meydana torê û helbestê de dûzbikin. Bi rastî, ger ew kesan dizanin, an jî nizanin, ewana kar û xebata xwe li ser pişta bê datînin, ger ba jî xwedî pişt be.

Ev yeke ji wan sedemên ku ta îro hiştine helbesta nû (serbest), di destên helbestvanên me de bilerize, lingên xwe di zemîna çanda me, ya îro, de neçikîne.

Helbestvanê me (Rûxweşê Zîvar) di vê berhevoka xwe de «Goristana bê gor» ji vê rewşê ne dûre, bi durv û şêweyê klasîk ve girêdayîye, lewra para pir ji helbestên wî klasîkîne, û gelek caran di bin giraniya yekseriyê (mubaşere) de mabû, wek çawa dibêje:

Siyonîst hirç û hovin
Şovînîst jê re tovin

û wek dibêje:

De bixemlîn bejna zirav

û wek:

Ey hevalên birîna dil

û wek:

Ey hevalên jar û reben

û li gelek ciyên dî.

Em dibêjin, çêtire ku pilan û dek û dubareyên siyonîst û şovînîstan berçav bibin, hîngê hovîtî û girêdana navbera wan wê zelal û sayî biba, û helbestvan jî wê ji vê yekseriyê rizgar biba û bandora helbestê li xwendevanan wê xurtir biba.

Lê wek xuyaye, (Rûxweş) dixweze xwe ji durvê kilasîk rizgar bike û gavekê ber ve, yê nûjen bavêje, ji ber ku gelek helbestên

serbest, wek (Berxwedan, Dildarî, Jîna bi du rûyan, Goristana bê gor, Hişyarî, Xwe nafroşim, Agirê bê dû û Pîna mirovan) di vê berhevokê de bi cih bûne. Lê xuyaye jê re xebat û xwendin divê, da ku karibe dengekî xweser di warê helbesta serbest de pêk bîne, ji ber ku bandora kilasîk li wî hîn bi hêz xuyaye û her kesê ku hêdî–hêdî helbesta (Xwe nafroşim) bixwîne, bê gûman, wê bigihe vê rastiyê. Raste, ew helbesta, serbest hatiye, lê bi hulmeke kilasîke.

Binêrin çi dibêje:

Ey neviyên hirç û hovan,
Dizên xwîna mirovan,
Dizên kenê zarokan,
Bayê gundan,
Ronahiya bajaran,
Axa welatan,
mafê miletan,
Ger hûn çavên min derxin
Diranên min bişkînin,
Neynûkên min hilkişînin,
Hestiyên min bişewtînin,

Ez nabêjim mast reşe.
Naxapim...
Ji were nabêjim erê.

Eger em careke din vê kîtê bixwînin, emê zû bizanin, ku ev kîta li du hulman suware; yek jê kilasîke, ji destpêkê ta «Hestiyên min bişewtînin», û ya dî (her sê rêzên dawî) nûjene. Her sê kîtên vê helbestê, bi vî awayî sazbûne. Ev hulma kilasîk di helbesta (Agirê bê dû) de jî berçave.

Lê belê hin helbestên dî, nemaze (Dildarî û Jîna bi du rûyan), didine diyar kirin ku helbestvanê me, hin bi hin, rêka xwe di meydana ya serbest de dûz dike. Girîngtirîn tişt, di tenga helbesta nûjen de, ewe ku divê helbestvan wan têkiliyên navbera tîpan û navbera peyvan de baş zanibe, ji ber ku ev cure-zanîn, di durvê helbestê de, xwedî rolekî girînge, û têkiliyên navbera peyvan, hulm û rewşa derûna (nefsani) helbestvan jî rolekî bilind dilîzin. Eger em vê kîtê bixwînin:

Şevan...
Şevên dijwar
Giran,
Direj,
Ker,
Kor,
Lal,
Ez kirim dildar...
Dildarê roya biharê.

bê gûman, emê rewşa derûna helbestvan nasbikin.

Xuyaye, helbestvanê me di rewşeke tehl û dijwar de dijî, ji ber ku tehlî ji van dîmenên (wesfên) şevê dibare û diherike, ew dijwariya jî gelekî giran û zore, ji ber ku dîmenên şevê pir bûn, û helbestvan jî dixweze zû bi serkeve, lewra jî ew dîmenan bi lez û bez, li dû hev hatine. Baweriya helbestvan jî bi serketinê zor tûje, ji ber ku ew şevên dijwar wî têvedidin ba biharê.

Di vê kurte–gotinê de, em nikarin li ber hemû helbestan rawestin, lê emê vî karî ji lêkolîneke xweser re bihêlin, û berhevoka (Rûxweşê Zîvar) têvedin û têxin nav destên xwendevanan. Lê em dixwezin bêjin xwediyê vê berhevokê wek diyare, dixweze dengekî xweser di meydana helbesta serbest û nûjen de bi cih bike, lê belê, wek em jî dibînin demeke ne nêzîk, afrandinên wî, yên diwarojê, wê her rû û aliyên wî dengî sayî bikin, ji ber ku me xwestî, an jî na, rewşa kurdî, li Sûriyê, îro ji ber valayîyeke fireh

dinale, û di bin toz û kulxanê de dimexele. Lewra divê û pir pêwîste ku kesên xwedî bîr û bawer û welatperwer destan vemalin û kar û barên ku ji wan tête xwestin bi cih bînin. Wê gelekî çêtir biba eger rêxistinên kurdî – çiqas jî pirin – ev yeka bikirina karê xwe, û pêwîste jî bikin, ji ber ku ev yeka di eni–ya daxwaz û armancên wan de bi ciye. Pêk–anîna vê daxwazê rastî û dilsoziya wî kesî, an wê hêzê diyar dike.

Lê mixabin, hîn bihayê çande û tore û rola ku di jiyana gel de dilîzin, li ba pir kesan, ne sayîye, û pir caran li ba xwedî bilintirîn–pêlekên berpirsiyariyê jî bihayê torê bin ling dibe, û çanda kurdî li ber astana nezaniyê qedexe dibe, û ta îro li ba pir kesên xwe pêşeng dibînin ne hatiye zanîn ku geşbûn û pêşketina çandê û torê yekemîn pêleke ji pêlekên pêşketina gelan.

25.09.1991

Hawarê Gundî

* * *

GULÎSTANA ROHILAT

Hey xunava li ser gulan !
derman û melhema kulan !
bihar û Newroza dilan !
helbest û strana bilbilan !
Xwîna hinavên min tuyî.
Hey kevoka li ser pîyan !
hêviya dîl û girtiyan !
heyv û pêrwîna rêwiyan !
roya bêkes û sêwiyan !
Roniya çavên min tuyî
Hey ava çem û kaniyan !
xûydana eniya çiyan !
siya gûz û merx û biyan !
hezkirina bav û diyan !
Barê silavên min tuyî.

Hey evîna «Mem» û «Zînê» !
vîna «Ferhad» û «şîrînê» !
bîna her fil û nesrînê !
mizgîna berbanga jînê !
Barana tavên min tuyî.
Hey «Zab û Dicle û Ferat» !
«şengal û Sîpan û Xelat» !
Hey gulîstana rohilat !
rêya tijî kar û xebat !
Dêya zaravên min tuyî.

* * *

EM RANABIN JI CÎHAN

Ey hevalên perîşan
Xwediyên doza giran
Bi sed hezar kul û jan
Em ranabin ji cîhan
Bi girtîgeh û zîndan
Bi girêdan û lêdan
Bi şewtandin û talan
Em ranabin ji cîhan
Bi rêjîmên kolîdar
Bi segên nandoz û har
Bi jehr û bombe û ar
Em ranabin ji cîhan

Bi siyonîzma zorker
Bi êrîş û ceng û şer

Bi top û tang û leşker
Em ranabin ji cîhan
Bi faşîstên wek «Evrîn»
Bi «Seddamê» dest bi xwîn
Bi «Fantomên» har û dîn
Em ranabin ji cîhan
Bi xwarina nanê hişk
Bi axayê wek dûpişk
Bi begê wek kêç û rişk
Em ranabin ji cîhan
Çiqas bigrin şêrên me
Bikujin camêrên me
Vemrînin sitêrên me
Em ranabin ji cîhan
Hişyar û serxwene em
Kar dikin her gav û dem
Bi me nikare sitem
Em ranabin ji cîhan

30.8.1981

* * *

KEVOKA AŞTIYÊ

Hey kevoka aştiyê
Şîrînê, dilovanê
Mizgîna yekîtiyê
Di nav gelên cîhanê
Ala mirovatiyê
Dijî zor û lêdanê
Nîşana biratiyê
Dijî ceng û talanê
Tu şopî him kilîtî
Bo deriyê jiyanê
Te divê her kes şabe
Bi vê dem û dewranê
Her kes bike û bixwe
Bi xebat û xûydanê

Bilind bijî wekhevî
Wek «Xelat» û «Sîpanê»

* * *

Hey kevoka evîndar
Fermo were ser çiyan
Derbasbe kurdistanê
Vexwe ava kaniyan
Bibîn çawa mêr û jin
Tên kuştin bi sungiyan
Çawa faşîst û xwînmij
Dikevin nav gundiyan
Destên xwe yên bi gemar
Davên keç û jinbiyan
Didin ber devên topan
Zarok û bav û diyan
Didine ber tajangan
Kal û pîr û sêwiyan
Hildiweşînin malan
Dişewtînin zeviyan

4.9.1983

* * *

KURDISTAN Û FELESTÎN

Li rohilata navîn
Bindest mane du şîrîn
Derbûne kul û birîn
Çem û derya bûne xwîn

* * *

pir zor û dijware jîn
Herdem bi girî û şîn
payîz, bihar û havîn
Dikin hawar û qîrîn

* * *

Bi roj dibare zihêr
pê gêj dibin jin û mêr
Bi şev tên kuştin sitêr
Sêser dibin şîp û şêr

* * *

Gund û zevî û bajar
Bê sûc dibin tar û mar
Dar û ber û gulbihar
Dişewitin bê jimar

* * *

Siyonîst hirç û hovin
Şovînîst jê re tovin
Ew neyarên mirovin
Ciyên wan rêl û govin

* * *

Dixwazin me bikin dîl
Li »Mihabad« û »Celîl»
Li «Diyarbekr» û «Xelîl»
Ji «Ferat» heya bi «Nîl»

* * *

Dil û cergên me kulin
Zarokên me bê cilin
Lê hêviyên me gulin
Em jê re tim bilbilin

* * *

Vaye em tev li her der
Dijî zorê dikin şer
Bo Felestînek xweser
Kurdistanek bê zorker

8.9.1980

* * *

SORGULA GULANÊ

Bi destên xwe me sorgul çand
Bi xûydana xwe me gihand
Ji rojên sar me parêzand
Me xwîna xwe bo wê rijand
Sorgul şîne, naçilmise
Em xwedîne, ne bê kese

Ewe hêvî û jîna me
Xemla li ser birîna me
Reng sore ew ji xwîna me
Bîn xweşe ji evîna me
Sorgul şîne, naçilmise
Em xwedîne, ne bê kese

Karkerên pêşeng û dilêr
Li hember dijminan bûn şêr
Gul nedan bi dolar û zêr
Kirin nîşana çîna jêr
Sorgul şîne, naçilmise
Em xwedîne, ne bê kese

Li şîkago girtin dîlan
Dan sorgulê kezeb û can
Rehên wê bi xwînê avdan
Xemilandin bi wê gulan

1.5.1984

* * *

DENGÊ MIROVATIYÊ

Ezim kaniya evînê
Hezkirina «Mem û Zînê»
Dengê «Ferhad û şîrînê»
Hêviya dildarên jînê

* * *

Ezim bayê xweş û xunav
Balgî û dergûş û kulav
Şîr û derman û nan û av
Bo zarokên bê dê û bav

* * *

Ezim deşt û çem û newal
Dibistan û kargeh û mal
Newroza şîrîn û delal
Ji bo keç û xortên şepal

* * *

Ezim ala belengazan
Kevoka aşitîxwazan
Perwaneya ser gulnazan
Nivîsara serfirazan

* * *

Ezim çakûça karkeran
Vîna niştimanperweran
Hêza reş û gewr û zeran
Vedimrînim ceng û şeran

* * *

Ezim dasa palevanan
Peyv û bilûra şivanan
Pênivîsa xwendevanan
Keyferata şoreşvanan

* * *

Ezim xebat û têkoşîn
Xwîna ji bo dilên xemgîn
Bîna kulîlkên nazenîn
Divejînim rûyê zemîn

* * *

Ezim roya tim hilatî
Dilovanî, mirovtî
Dostî, hevalî, biratî
Ji bo gelê her welatî

20.2.1985

* * *

ÇAVREŞA MIN

Hey çavreşê, hey xezalê
Şox û şîrîn û delalê
Ji xew şiyarbe hevalê
Dijî zorê hilde alê

* * *

Vaye tê cejna sersalê
Derkeve j'hundirê malê
Qet guh nede pîr û kalê
Ew bawerin hîn bi falê

* * *

Wan tu hişt bê ziman û zar
Nezan û bê vîn û biryar
Dixwazin te bikin bazar
Bo te qelen bikin hefsar

* * *

Hey dilbera bê deng û nav
Vaye jînê kildane çav
Hat xweş bihar, barî xunav
Kanî derbûn, herikî av

* * *

De bixemlîn bejna zirav
Derkeve wek tîrêj û tav
Da em herin pêş gav bi gav
Gulan avdin, bijîn li nav

13.4.1985

* * *

OKTOBER

Zivistana reş û tarî
Berê xwe da rêya revê
Dem derbas bû bi dijwarî
Lê rojê zor da ser şevê
Geş û aza bûn pir welat
pir gel gihiştin ser heyvê
Em hîn dikin kar û xebat
Ji bo serbestiya peyvê
Lênîn dîrokek nû çêkir
Vejandin rehên evînê
Tava biharê dest pêkir
Derkirin kaniyên jînê
Lê dîsa şên nebûn govend
Li welatê «Mem» û «Zînê»
«Siyamend» ma dûr ji «Xecê»
«Ferhad» negiha «şîrînê»

20,4.1985

YARÊ

Yarê, delalê, şîrînê
Tu ketî dil mîna xwînê
Ez dam ber çerxa evînê
Kirim evîndarê jînê

* * *

Tuyî nesrîn, tuyî sorgul
Melhema ser birînên kul
Dilovanim nola bilbil
Dixwînim li ser te ji dil

* * *

Tuyî zevî û gulîstan
Ezim cotkarê perîşan

Tuyî dezge û dibistan
Ezim karker û xwendevan

* * *

Tu yî «Newroz» a dilovan
Ezim «kawa» yê şoreşvan
Tuyî dar û ber û zozan
Ezim av û ba û baran

* * *

Tuyî bêrîvana ciwan
Ezim şivanê bilûrvan
Tuyî helbest, tuyî stiran
Ezim dengbêj û helbestvan

* * *

Tuyî «Zîn» a dil bi kovan
Ezim «Memê» kezeb talan
cîhan li min bûye zîndan
Dilbirînim, Tuyî derman

16.4.1985

MIN RÊ NASKIR

Ji dema bûm li nav palê
Li ser axa germ, li çolê
Di rojek winda ji salê
Min rêya jîna xwe naskir
Ji roja min vekirin çav
Li nanê hişk û tehl û xav
Li jîna bê tîrêj û tav
Min rêya jîna xwe naskir
ji şeva seg har bûn bi lez
Guran bi me nehiştin pez
Wêranê talankirin rez
Min rêya jîna xwe naskir
Ji hefteya min dîtin diz
Bihîst dengê kewên xiniz
Nasîn «Ehreman» û «Hurmiz»
Min rêya jîna xwe naskir

Ji meha hatim cîhanê
Nîtron xwe berda meydanê
Zarok gazîn, şîr nedanê
Min rêya jîna xwe naskir
Ji sala min Dyalîktîk xwend
Di mejiyê xwe de kûr çand
Pişta nezaniyê şikand
Min rêya jîna xwe naskir

8.7.1985

* * *

HEVALA MIN

Hevala vîn û jîna min
Dil û ziman û xwîna min
Ketin û serxwebûna min
Tunebûn û hebûna min
Hevala min, delala min
Gula cejn û sersala min
Tuyî dermanê kulên min
Hêza di dest û milên min
Bîna kulîlk û gulên min
Dengê kew û bilbilên min
Hevala min, delala min
Gula cejn û sersala
Tu xemên min direvînî
Birînên min dikewînî
Xwe wek mûmê dişewtînî
Da jîna min bixemlînî
Hevala min, delala min

Gula cejn û sersala min
Tuyî tîna hinavên min
roniya herdu çavên min
Nivîsara silavên min
Keştîvana peravên min
Hevala min, delala min
Gula cejn û sersala min
Tuyî peyman û soza min
Bayê xweş û bahoza min
Gulbihara «Newroz» a min
Hevala rê û doza min
Hevala min, delala min
Gula cejn û sersala min

24.9.1985

* * *

GULBIHAR

Gulbiharek min heye
Gupikek hîn tezeye
Kurmek di kokê deye
Xebat jê re çareye

* * *

Roya sor xemiland jîn
Kevok û bilbil firîn
Şabûn hejar û xemgîn
Dîsa ez mam dilbirîn

* * *

Baran barî, çem meşîn
Lê gula min neda bîn
Ba û bahoz lê civîn
Pelên wê zerbûn, weşîn

* * *

Navê wê yê xweş û rind
Gihaye «Nehro» yê Hind
Bejna yekta û bilind
Bûye çar ta di bin kund

* * *

Hin hatin me bi bivir
Hin bi top û balafir
Lê evîna me nemir
Li ser çiyan bû agir

* * *

Divê em evîndar tev
Bibin yek ji dil û dev
Kar bikin bi roj û şev
Kurm bikujin digelhev

5.10.1985

* * *

EFRÎN

Efrîn bûkek delalê
Ne bê ziman û lale
Pir çeleng û şepale
Bi royê re hevale

* * *

Çiya li rêz û qorin
Ji wê re bisk û porin
Çavên wê, stêrên jorin
Lêvên wê, gulên sorin

* * *

Çar hawîr wê, zêtûnin
Mêw, binefş û beybûnin
Gundên beşt û bêtûnin
Kaniyên şîr û rûnin

* * *

Zivistanê berf tê xwar
Sipî dibin lat û dar
Tê bayekî tûj û sar
Xweş dibin çîrok û ar

* * *

Havînê dexl dibe zer
Dem dibe zêr û gewher
Digerin aş û cercer
Bi çûçikan şîn tên per

* * *

Biharê gul dibin geş
Tê bayê hênik û xweş
Bi mirov xweş dibe meş
Ji malan der tên çavreş

* * *

Efrîn her dem sorgule
Dermanê dilên kule
Xunav ji wê re kile
Rûxweş jê re bilbile

13.11.1985

* * *

BÛKA BINDEST

Ey hevalên birîna dil
Evîndarên gulbiharê
Ka dermanê birîna kul
Ka melhema çavên yarê?!
Li me şikestin dest û mil
Dengê me ket ji hawarê
Li ser piştên me rizîn cil
Weşîn mîna pelên darê
Kedxwaran em kirin kakil
Da ku ji me bikin karê
Çima hûn guh nadin bilbil
Nabin yek bo gulîzarê?

* * *

Ey hevalên jar û reben
Dahola şoreşê lêxin

Da ku bi rûyekî li ken
Em arê «Newrozê» vêxin
Ji zindanên kolîdaran
Bûka xwe bi roniyê xin
Li ser kulîlkên di malan
Desmala aştiyê rêxin
Bêjin: birînên hevalan
Di dilên me de wek mêxin
Ne ew qulên kendalane
Ne jî daxên zikê şêxin

* * *

Azadî «Şîrîn» û «Zîn» e
Qelen kar û têkoşîne
Kî «Ferhad» ê dilbirîne
Divê çiyan bihejîne
Kî «Mem» ê dîl û xemgîne
Divê gulek sor biçîne
Gul zivistanê nebîne
biharê xweş naxemlîne
Heke mûm xwe neşewtîne
Ronahiyê navejîne
Dilê tirsonek û bizdok
Sîngê sipî qet nabîne

27.3.1986

NEWROZA 1986 an

Bihara xweş kildan çav
Bi derket hingûra sor
Li ser gulan ket xunav
Royê berê xwe da jor
Em bûn wek tîrêj û tav
Me ranawestîne zor
Me divê her dem û gav
Serfirazî an jî gor

* * *

Newroze, bûka delal
Bûka rû heyv, çav sitêr
Sîng ava «Dicl» a zelal
Cerg «Sîpan» a tijî şêr
Can Mihabad û «Şengal»
Kezeb «Amed» û «Hevlêr»

Cezîr jê re bejn û bal
«Efrîn» gerdenê ji zêr

* * *

Yare, bûka biharê
Bûka dil, derya jînê
Bejin, dara çinarê
Hatî avdan bi xwînê
Bahoz bi wê nikarê
Reh kûrin di evînê
Kî dest dirêjke yarê
Ew ji Dehak namînê

* * *

Vaye gelê me îsal
Bi kevr û bang û dengan
Bo yara xwe ya delal
Xwe berda şer û cengan
«Silêmên» bilind kir al
Sîngê xwe da fişengan
Bi «Kawa» re bû heval
Ket nav refên lehengan

BARAN

Bibar baranê, bibar
Tî mane gund û bajar
Çilmisîne gul û dar
Jar û xemgînin cotkar

* * *

De kela dil birêje
Dem bê te pir dirêje
Evîna te ji mêje
Her kes pê mest û gêje

* * *

Bibar hey evîndarê
Bikuj bîna gemarê

Bixemlîne biharê
Bilbil bighîne yarê

* * *

Delalê, nazenînê
Hevalê, xemrevînê
Derke kaniya jînê
Da ku kes tî nemînê

* * *

Da geş bibin gul, sosin
Avabe malek mezin
Gel tev dilxweş û şabin
Şer ji cîhanê rabin

* * *

8.6.1986

HEYVA DIL

Heyva dil çav dan ber kilê
Por şekir bi ava filê
Rû xemiland wek sorgulê
Nehişt heyva şevê hilê

* * *

Enî royê, bejin tavê
Dema keskesor da navê
Kemend avêt dilê zavê
Agir berda ax û avê

* * *

Meş û gera wê kevokê
Dilê min hilkir ji kokê
xeml û xêza dilbijokê
Ez dîn kirim li dîrokê

Çiqas li ser wê bibêjim
Kela dilê xwe narêjim
Li ber sazê wê dengbêjim
Ji ber evîna wê gêjim

* * *

Wê dilê min kirî zengil
Zimanê min kirî bilbil
Kezeba min kirî kakil
Li min şikandine pî, mil

* * *

Ew ji min re bûye leylan
Bûye xewna şevên giran
Bûye ronahî û zîndan
Bûye bihar û zivistan

* * *

Bi evîna wê sermestim
Jê re dîlok û helbestim
Di dilê wê de bindestim
Dînekî evînperestim

* * *

ZAROKÊN ŞEREVAN

Di şevek tarî, di rojek xemgîn
Hovên mirovxwar ketin «Dêryasîn»
Bihara jînê kirin golek xwîn
Kal û pîr û jin tê de pirpitîn

* * *

Li «Keferqasêm», çem sor herikîn
Li ber wan şînbûn kulîlk û nesrîn
Şîrmij mezinbûn, avakirin jîn
Di bin «Şaron» de hejandin zemîn

* * *

Berbang xuyabû, şiyarbûn zarok
Digel wan şabûn çivîk û kevok

Bilbilan xwendin awaz û dîlok
Vejandin ji nû tevger û dîrok

* * *

Şerevanên çûk pêşve çûn wek şêr
Bi agir û pêt, bi kevir û kêr
Êrîş kirin ser hemdemên «Hîtlêr»
Ewrên di reş çûn, derkertin sitêr

* * *

Gelên cîhanê ra bûn pêl bi pêl
Pîroz kirin al li bejna «Kermêl»
Hil kirin rehên ramana «Hirtzêl»
Rûyê «Rîgan» û «Şamîr» kirin sêl

* * *

Karker û cotkar bûn «Ferat» û «Nîl»
Em her bawerin gel namînin dîl
Royê xweş hilê li banê «Xelîl»
Sorgulê vebin li «Quds» û «Celîl»

1.9.1988

* * *

HELEBÇE

Hawar û bang hey miletên cîhanê
Bihara xweş kuştin li «Kurdistanê»
Jehra marên reş ket şûna baranê
Berbang û roj kirin mîna zîndanê

* * *

Bombeyên kîmawî barîn wek zîpik
Şewitandin gul û kulîlk û gupik
Peritandin dil û dergûş û landik
Herikandin çem bi hêstir û rondik

* * *

Seddamê bednav û bêjî û çepel
Ji «Rîgan» re bûye noker û guhbel
Bi top û tang û «Siyanîd» û «Xerdel»
Gund û bajar kirin dojeh û mezel

* * *

Gurê har û dev bi xwîn û diranşûr
Êrîş kir ser gel li bakur û başûr
Nişтimanê birîndar kir goştê hûr
Nehiştin awaz û dîlan û bilûr

* * *

Kal û pîr û zarok û jin belavbûn
Hin bê dest û ling û ziman û çavbûn
Hin bê xwîşk û bira û dê û bavbûn
Li bin konan bê cil û nan û avbûn

* * *

«Dehak» ê nû dixwaze me talanke
Da ku kula mejiyê xwe dermanke
«Hîtlêr» nikare avê li destanke
Lê çakûçê jê re gorê nîşanke

* * *

Ey «Seddam» ey şagirtê «Mosolînî»
Tu nikarî roya jînê vemrînî
Piştî îro tu rojek xweş nabînî
Demek nîzîk tu ji «Qeyser» namînî

* * *

Hey belengaz û hejar û cewêlek !
Vane dijmin me dikujin lek bi lek
Çima em tev bo mafê xwe nabin yek ?
Da ku xweş ava bikin bira belek

* * *

KEÇA JÎR

Hey keça jîr û jêhatî
Tu heyv û roya welatî
Kaniya kar û xebatî
Xeml û xêza rohilatî

* * *

Tu «şîrîn» û «Xec» û «Zînî»
Valantîna û «Zîtkînî»
Dara hebûn û evînî
Ji rojên geş re mizgînî

* * *

Tu »Leyla« merd û pêşengî
Bi nav û nîşan û dengî
Di şevên reş de perengî
Di zîndanan de lehengî

* * *

Tu hevalî, dost û yarî
gul û kulîlkî, biharî
Kevoka şeng û şiyarî
Ji bo milet canbêzarî

* * *

Tu nan û ba û baranî
çem û çiya û zozanî
Govend û geşt û dîlanî
Dibistana niştimanî

* * *

BIRÎNA REŞ

Paşverûŷn destdirêj
Dilreşên mejî qerêj
Çerxa me, çep gerandin
Çend çira me, mirandin
Nifûs ji me sitandin
«Şawî» li nav me çandin
Bi dû çiya veşartin
Navên gundan guhartin
Gotin: kurd ne ji virin
Bê ax û bê kevirin
Ne gel û ne miletin
Koçerên bê dewletin !
Bi vî reng û awayî
Reş kirin rojên sayî
Rêya durust kirin şaş
Belengaz hiştin li paş
Xapandin jar û nezan

Talan kirin niştiman
Kurd û erebên reben
Bi dest xwe de kirin ken
Roj li pêş wan kirin şev
Mîna dîkan berdan hev
Da ku bimînin bêkêr
Li hember wan nebin şêr
Hevalno, ! yeke birîn
Yeke hêviya şîrîn
Bese gilî û hawar
me divê xebat û kar
Divê hejar û bindest
Bi vînek xurt û serbest
Hemî şiyarbin ji xew
Ji kesî re nebin kew
Bi hev re tev bilivin
Bê tirs li hev bicivin
Bibin yek bo jînek xweş
Welêt bikin gulek geş
Wergerînin çewsokan
Bigirin pîrhebokan
Biguhêrin zîndanan
Bi bax û gulîstanan

30.10.1989

DERMAN

Ey hevalên rêya dûr
Bi nihrînek hûr û kûr
Birîna xwe binasin
Da ku em tim nebasin
Guh nedin serekên şaş
Ew ji kar xwe didin paş
Xwe li pêş me jîr dikin
lê zû me ji bîr dikin
Bi gotin û awazan
Kom dikin belengazan
Bi navê şoreşvanan
Dixapînin nezanan
Ew dibêjin: em şêrin
Lê roviyên bêkêrin
Di peyvê de bilbilin
Di kar de derd û kulin

Wan girêdan çav û dev
Em bi dûrxistin ji hev
Xwe kirin beg û keya
Pir kirin dûv û peya
Em li ba xwe kirin pez
Her kesî got: şivan ez
Gur hatin me bê jimar
Çima em nabin hişyar ?

Hevalno çavan vekin
Vê rastiyê çenekin
Berî roj dibin zîndan
Em hemî dibin poşman
Rabin bibin xwedî şîn
Li hêviya meye jîn
Milet maye mat û gêj
Li benda meye ji mêj
Werin li ber roya geş
Biçirînin pelkên reş
Parçebûn malwêrane
Yekîtî xweş dermane
Bibin yek bi kar û vîn

Bila vemrin şer û kîn
Di dilan de vebin gul
Nemînin keser û kul
Da ku mejî bivejin
Serî vala nehejin
Em ala milet hildin
Çavên biharê kildin

23.11.1989

DILBER

Navxweşê, xwînşîrînê
Rûgeşê, xemrevînê
Ji şeva tu bûyî heyv
Min dane te deng û peyv
Tu tenê yara minî
Bang û hawara minî
Gerdenê te ji stêran
Nadim bi zîv û zêran
Por û bijangên te reş
Nadim bi kulîlkên geş
Her lêvek te nazenîn
nadim bi sed Xec û zîn.
Dilawerê, ciwanê
Dilberê, dilovanê
Ji roja tu bûyî tav
Min dane te herdu çav

Tu xeml û xêza minî
Jêdera hêza minî
Ji min re bûyî sorgul
Ji te re bûme bilbil
Her ku derbas dibe jîn
Bi me xweş dibe evîn
Çiqas ku dijwar be dem
Bi me nikarin kelem

20.1.1990

* * *

BERXWEDAN

(1)

Xweşe bi min...
Rêya dijwar
Dûr û dirêj
Tijî bombe
Di nava ar
Tev bi stirî û kelem
Bi keser û kul û xem.
li hawîr wê dûpişk û mar
Tê de keftar,
Hirç û hov
Êrîş dikin ser mirov.
Mîna segê çavsor û har
Hîngê ezê bibim çem
Pêşve herim her gav û dem

Dizên milet bikim mirdar
Avdim binefş û sorgulan
Vejînim dengê bilbilan
Jînê bikim cejn û bihar

(2)

Xweşe bi min...
Zîndana reş
Şeva tarî,
Belengazî û hejarî,
Birîna kûr,
Tajanga xwînmij,
Zincîra qirêj.
Da ji bo min bibin tîrêj,
Berxwedana min bikin tav,
Xebata min bikin xunav,
Xwîna dilê min bikin av
Ji bo gulbiharên tî,
Vebin li her der û cî,
Bîna wana bibe derman.
Bi gurzên wan,
Bi rengên wan
Bixemlin govend û dîlan.

(3)

Xweşe bi min...
Meşa li ser kizotan.
Raketina li ser berfê.
Ava şûna simên hespan.
Jehra marên binzikzer.
Nanê cehî,
Garisî.
Mirina bê kefen û gor.
Da nemîne zor
şabin perîşan û reben
Zarok bijîn tim rûliken
Ji nav gelan rabin sînor.

(4)

Xweşe bi min...
Hilgirtina barê giran
Zikxuşiya ser stiriyan.
Candana bi rûmet û şan
Bo cîhanek ronak û geş
Cîhanek bê diz û keş
Bê derd û êş û kul û jan

Bê top û tang
Bê bombe, tiving û leşker
Bê ceng û şer
Tevde zevî û gulîstan
Milet hemî tê de bira
Zemîn ji gişkan re çira
Mirovatî jê re nîşan.

* * *

DILDARÎ

(1)

Şevan...
Şevên dijwar,
Giran
Dirêj
Ker
Kor
Lal.
Ez Kirim dildar,
Dildarê roya biharê.

(2)

Girtîgehan...
Girtîgehên bê derî,

Bê pencere
Bê dîwar
Bê ban
Bê têl û stirî
Ez kirim dildar,
Dildarê azadiyê.

(3)

Nexweşiyan...
Nexwşiyên tehl,
Tirş
Tûj
Şor
Kevin
Nû.
Ez kirim dildar,
Dildarê pêşveçûnê.

(4)

Birînan...
Birînên bê xwîn,
Bê reng
Tayên mirinê

Xewnên bi roj
Keserên kûr
Ez kirim dildar,
Dildarê jînê.

(5)

Ceng û şeran...
Ceng û şerên germ,
Sar
Xwînvexwar
Mirovxwar.
Ez kirim dildar,
Dildarê aşitiyê.

(6)

Maran...
Marên bi ling.
Roviyan...
Roviyên bi cil û sol.
Keran...
Kerên bê dûv û hevsar.
Ez kirim dildar,
Dildarê mirovatiyê.

JÎNA BI DU RÛYAN

(1)

Hey jînê... !
Şadî û şînê... !
Çima tu ji hinan re.
Bihara xweşî
Gula tim geşî
Heyva rûlikenî
roya dilovanî
Keskesorî
Cejnî
Govend û dîlanî.
Ji hinan re,
Zivistana Tariyî
Şeva reşî
Zîndana bê biniyî

Birîna bê dawiyî
Mirina roj bi rojî. ?

(2)

Hey jînê... !
Derd û dermanê... !
Çima tu ji hinan re,
Bayê hênikî
Ava zelalî
Rêya dûzî
Qesra bilindî.
Tirambêla dirêjî
Xewa bê tirsî
Nişţimanê serfirazî
Dengê serbestî.
Ji hinan re,
Rêya kaşî
sola bin qulî
kerê pişt kulî
Hespê dariyî
Axuri
Kozikî
Pînî

Welatê bê bayî
Zimanê bindestî. ?

(3)

Hey jînê... !
Tehl û şîrînê... !
Çima tu ji hinan re,
Her dem hinguvî
Ji hinan re,
Tim zihêrî. ?

* * *

XWE NAFROŞIM

(1)

Ey neviyên hirç û hovan !..
Dizên xwîna mirovan !...
Dizên kenê zarokan !..
Bayê gundan,
Ronahiya bajaran,
Axa welatan,
Mafê miletan.
Ger hûn çavên min derxin,
Diranên min bişkînin,
Neynûkên min hilkişînin,
Hestiyên min bişewtînin.
Ez nabêjim mast reşe,
Naxapim...
Ji we re nabêjim erê.

(2)

Ey neyarên jiyanê !...
Mîrên girtinê,
Lêdanê,
Tîkirinê,
birçîkirinê,
Kuştinê,
Darxistinê.
Ger hûn tiliyên min yeko – yeko hilkin,
Zimanê min bibirin,
Min bi guhan bi darvekin,
Goştê min çênî bi çênî;
Parçe bi parçe
Ji min bikin,
Canê min bikişînin,
Ji rêya xwe venagerim,
Poşman nabim,
Serê xwe naçemînim,
Ji we re nabêjim erê.

(3)

Ey dijminên roya geş,
dijminên kulîlk û gulan,
kevok û bilbilan,
dar û beran,
Heyv û stêran.
Ger hûn perên dewletan,
Zêrên cîhanê,
Hemiyan komkin,
Di mista min kin.
Nabêjim tarî – roniye;
Reş – sipiye.
Xwe nafroşim,
Tucarî,
Ji we re nabêjim erê.

* * *

AGIRÊ BÊ DÛ

(1)

AX Yarê !...
zivistanê, !
biharê, !
Tu dizanî,
Ku ji dil û canê min re,
Ji herdu çavên min re,
Rûçikekî te heyva dilovane,
Rûçikek roya geşe !..
Çima tu bê mehderî,
Jîna min dikî tarî ?!...

(2)

Ax yarê !..
Derd û dermanê !
Pêt û arê !
Tu dizanî,
Ku roj bi roj,
hêdî hêdî.
Agirê evîna te,
Can û goştê min dixwe.
Xwîna min dikelîne,
Hestiyan dişewtîne.
Ne berf,
Ne baran,
Ne ava çeman,
Ne pêlên deryan,
Nikarin wî vemrînin.
Çima tu bi peyvek xweş,
bi nirînek rûliken,
Dilê min hênik nakî ?!...

* * *

PÎNA MIROVAN

(1)

Ev ezmana..
ezmanê nizm,
hişk,
bê keskesor,
bê hingûr,
bê ro;
bê heyv û stêr,
Nahêle serê xwe rakim.

(2)

Ev axa...
axa tî;

birçî,
tazî,
gefş
tijî qul,
bi derd û kul,
Nahêle ez pêşve herim.

(3)

Ev baya...
bayê ziwa,
giran,
bê can,
bê baran,
bê xunav,
germ,
Nahêle bîna xwe bikşînim.

(4)

Ev gunda..
gundê tijî gur,
tijî keftar,
çeqel,
rovî,

dûpişk û mar,
Nahêle bê tirs rakevim.

(5)

Ev bajara...
bajarê tijî kelmêş,
tijî mêş
mişk,
seg,
Nahêle serbest bimeşim.

(6)

Ev welata..
Welatê xemgîn,
dîl,
zîndana mezin,
pîna mirovan,
Nahêle ez bihara jînê bibînim.

* * *

GORISTANA BÊ GOR

(1)

Dîsa..
Careke din..
Cara dehan,
Roviyê «Bexdayê» çavên me xapandin.
Dûmana reş,
Ji me dizî roya geş,
Heyv û stêrên me veşartin.
Roj û şevên me bûn zîndan
Bihara me bû zivistan
Ezmanê me har û dîn bû
Bahozek zer li me rabû
Bayekî tehl,
Tûj

Ji her aliyekî de hat
Qirikên mirovxwar firîn
Birûsk û bombe teqîn
Agirê lal û ker û kor
«Napalm» û «Fosfor»
Bi nav çavên me de barîn.

(2)

Dîsa..
Careke din..
Cara sedî,
Me guh neda hiş û mejî
Me xwest guran bikin kedî,
Masiyan tîmarkin bejî.
Li pêş çavên me dost û yar bûn dijmin,
Neyar û dijmin bûn dost.
Bi vî rengî,
Vî awayî,
Zemîn di bin me de hejî,
Lat û zinar,
Ban û dîwar,
Bi ser me de hatin xar.
Kurdistana me ya başûr

Tev bû tar û mar
Bû «Helebçe»
Bû dojeha bê sînor
Goristana bê kêl û gor.

(3)

Dîsa..
Careke din..
Cara hezarî,
Bi ser me de hat ewrekî tarî
Derd jê weşîn
Zihêr jê barî
Em hin pê ketin xewê,
Xewa giran
Xewa bê rabûn.
Hin li ser çiyan,
Li ber sînoran
Pij û belav bûn
Roj bi me bûn meh
Meh bi me bûn sal
Rê li pêş me winda bûn.
Bi çend hêstiran
Bi navê parastinê,
Alîkariyê.

Gur û keftar û hirçan,
Xwe li me kirin mêvan
Em bûn nêçîra hovan.
çima nayê banga şêran,
Dengê kevok û bilbilan
Bîna kulîlk û sorgulan. ?
ka hevalên bindestan. ?

15.4.1991

* * *

HIŞYARÎ

(1)

Aniha...
Piştî ku ez bê hiş rabûm,
Bê çav meşîm,
Bezîm,
ketim,
Êşîm,
Min xewna xwe bi roj dît.
Bê dibistan,
Bê mamoste,
Ez hînî xwendinek nû bûm;
Xwendina tîpên ne diyar.
Hînî bihîstinek nû bûm;
Bihîstina peyvên bê deng.

Min xwe naskir,
Bawer kir:
«Heke ker ket,
Ji xwediyan nîne xurtir».

(2)

Aniha...
Piştî ku ez mat û gêj bûm,
Winda bûm,
Bi şîretên xwedêyê nû;
Xwedêyê bê vac û durû.
Bi sozên pêxemberên kevn,
Pêxemberên bi kirasekî nûjen.
Çavên min bûn çar,
Guhên min bûne hezar,
Hişê min şiyar bû ji xewa giran.
Min digel banga cangorên doza xwe,
Li ber ronahiya êş û birînên xwe,
Rêya berbangê naskir.

(3)

Aniha...
Piştî ku bi xwîna min,
Bi xûydana eniya min,
Bi tîna cerg û dilê min,
Dara mejiyê min giha,
Evîna min berê xwe da.
Min gavek xurt;
Gavek bi cî,
Hêja,
Ber bi roya geş avêt.
Ji memikên wê roniya jînê mêt.
Ji çavên wê soza bihara xwe bir.
Min bi çakûça «kawa»,
Dîwarê bêdengiya xwe hilweşand.
Bi şûrê «Ristem» ê Zal,
Perda tariyê çirand.
Ezê navê yara xwe,
Yara pêşîn û paşîn,
Navê kurdistana xwe,
Bi tîrêjan binivîsi,.

* * *

Bi vî rengî
vî awayî
Zemîn di bin me de
..heji
Lat û zinar
Ban û diwar
Bi ser me de ...
..hatin xar
KURDISTANA me ya
...başûr
Tev bû tar û mar
Bû HELEBÇE ...
Bû dojeha bê ..
..sînor
Goristana bê kêl
û gor .

BÎHA (50)L.S